Agahî li ser Anketa dibistanê ya ji bo dêûbavan

Silav,

Niha dema bersivdana Anketa dibistanê hatîye. Anketa dibistanê lêkolînekê li ser webê ye ku berê xwe dide dêûbav/welî, şagird û personelên pedagojîyê. **Anket divê di navbera tarîxên 2023-01-23 – 2023-02-24 de were bersivandin.**

Mafê hemû zarokan e ku di jîngeheke ewle de perwerdeyeke baş bibînin. Mifetîşîya dibistanan ya gîştî (Skolinspektionen) meqameke çavdêrîyê ya dewletî ye û kontrolê dike ku hemû dibistan van şert û mercan pêk bînin. Encamên anketan bingeheke girîng ya çavdêrîya Mifetîşîya dibistanan ya gîştî ye. Armanc ew e ku mil bidin ber xebata ji bo dibistaneke baştir û bi encamên baştir. Bersivên têne dayîn dê her weha weke îstatîstîk dê werine rêkûpêk kirin û piştre werin şandin ji bo Servîsa agahîyê ya dêûbav û şagirdan ku girêdayi Daîreya dibistanan ya gîştî (Skolverket) ye.

Tu yê ku **dêûbavê zarokek li sinifa pêşdibistanî, Dibistana bingehî yan jî Dibistana bingehî ya taybetî yî x**wedî wê derfetê yî ku bi rêya Anketa dibistanê nêrînên xwe pêşkêş bikî. Anketa dibistanê li ser webê tê bersivandin û derdora 10 deqîqe wext digire. Heger çend zarokên te li heman dibistanê hebin wê demê serê her zarokek carekî anket dadigirî. Encamên anketan bi awayeke rêkûpêkkirî dê werin aşkerekirin û pêşkêşkirina wan dê ne bi tu awayeke wisa be ku karibe zerarê bide takekesan. Bersivên anketan ji alîyê dibistanê ve nayêne dabaşkirin (lênêrîn), berpirsîyarîya vê yekê ya Mifetîşîya dibistanan ya gîştî ye.

Anketa dibistanan her weha ji alîyê personelên pedagojîkî ve jî tê bersivandin. Her weha şagirdên sinifên 5 û 8 yê Dibistana bingehî û sinifa 2 ya lîseyê jî anket dibersivînin. Şagird anket di dema xwe ya li dibistanê de dadigirin. Heger zarokek te di sinifa 5 an 8'an de ye û tu **naxwazî** ew anketê bibersivîne, wê demê divê tu vê yekê ji dibistanê re bibêjî.

Anket wiha dibersivînî:

1. Li vê lînkê bitikîne www.skolinspektionen.se/skolenkaten
2. Welîyên zarokên li Dibistana bingehî yan jî Dibistana bingehî ya taybetî: Vê lînkê bitikîne "föräldrar/vårdnadshavare med barn i förskoleklass, grundskola eller grundsärskola" Anket, hetanî di navbera vê tarîxê de bibersivîne 2023-01-23 hetanî 2022-02-24.
3. Şîfreya ku li kêleka rastê ya di nameya agahîyê (ya dibistana zaroka te şandîye) de hatîye danîn, binivîsîne.

Heger di derbarê kod (şîfre) û agahîyên têketinê (inloggning) de pirsên te hebin bi Origo Group re bi rêya telefonê 013-465 61 00 yan jî bi e-namaya skolenkaten@origogroup.com têkilî deyne. Heger wekî din pirsên te hebin dikarî her weha bi me re jî bi rêya telefona sekreterayaya Mifetîşîya dibistanan ya gîştî 08-586 080 00 yan jî e-nameya wê skolenkaten@skolinspektionen.se têkilî deynî.

Ji bo agahîyên zêdetir yên li ser Anketa dibistanê (Skolenkäten) serî li vê malperê bide www.skolinspektionen.se/skolenkaten.

Spas ji bo ku tu wexta xwe didî bersivdana anketê. Ji bo me gelekî girîng e ka em zanibin nêrînên te yên li ser dibistana zaroka/zarokên te çi ne!

Bi silavên dostane,
Mifetîşîya dibistanan ya gîştî (Skolinspektionen)